R:2

**Deqê peyama rêzdar Mistafa Hicrî bi....**




R:4

**Daxuyaniya bidawîhatina kongireya 15'ê a PDKÎ**



R:5

**Îran di Sûriyê de çi dike**



R:7

**Ehmedînijad vê carê nexwast bîr û raya....**




**Bidestveanîna Mafên Netewî Yên Gelê Kurd Di Çarçoveya Îranek Demokratîk û Federal De**

**Hejmar: 192**

**9'ê Çiriya Pêşîn a 2012'an**

**Buha: 150 Tûmen**



# Agirî

Kongireya 15'ê a PDKÎ ku roja 8'ê Rezberê li jêr navê kongireya Dr. Şerefkendî û li jêr dirûşma hewildan bo yekrêzî li pêxema serkevtinê de dest pêkiribû, roja 14'ê Rezberê dawî bi karên xwe anî û biryarnameyek jî pesend kir. Deqê vê biryarnamê li rûpela 4'ê de hatiye.


Duheftînameyek siyasî, civakî, çandî û giştî ye ku Partiya Demokrat a Kurdistana Iranê diweşîne     www.kurdistanmedia.com/kurdî


Birêz Mistafa Hicrî:

## Me tekoşîna partiya xwe xiste ber rexneyên bêrehmane, bona ku zêdetir kar bikin



## Sergotar

### Rabûna bazariyan

**Şehab Xalidî**

Meşa nerazîbûnê a hefteya borî ya bazariyan li Tehran û çend bajarên din ên Îranê ji dîtingehên curbicur ve hate şirovekirin, lê şiroveya herî balkêş ew bû ku renge destê dewleta Ehmedînijad bixwe di anîna bazariyan ji riya şandina SMS'an ve bo ser şeqama hebûye, da ku bi vî awayî bikarin rewşê weha aloz bikin ku pêşiya destbiserkirina alîkarê yekem ê Ehmedînijad wate Mihemedriza Rehîmî bigrin ku hukmê destbiserkirina wî hatibû derkirin.

Lê Ehmedînijad serkomarê rejîma Îranê di konferanseke çapemeniyê de ragehand ku sedema vê rewşa aloz siyaseta aboriya dewletê nine, belkû li encama tehrîma neftê û tehrîma Banka Nawendî û herweha şerê derûnî û propagendeyî li navxwe de, erz buha bûye, û li encam de nerizayetiyek weha pêk aniye.

Serbarê vê ku karnasên aborî siyasetên aboriya dewleta Ehmedînijad wek çavkaniya wan hemû kirîzên aborî dizanin, lê heke ew rewşa tenê li encama tehrîmên DYA û hevalbendên wan li ser neft û banka nawendî a Îranê jî be, dîsan jî eva siyaseta dewleta Ehmedînijad û nizama wan bi giştî ye ku bûye sedema dasepandina wan tehrîman, ku giraniya bêqas û daketina buhayê diravê Îranê û li encam de nerizayetiya bazariyan lê ketiye.

Xala balkêş ew e ku deshilatdarên rejîmê ku li hemberî wan hemû kirîzên aborî û siyasî ên welat de bêçare mane, berbûne canê hevudin û her yek bi awayekê dixwaze xwe li jêr barê wan kirîzan rizgar bike û tawana wan kirîzan bêxe stûyê aliyê din de.

Heke ew kirîz bi taybetî di warê aborî de berdewam bike, êdî êminkirina rewşê bi zora hêzên leşkerî tenê dikare dermaneke êşbir bo heyameke kêm be, ne bo heta heta.

www.vakurdi.org

# Deqê peyama rêzdar Mistafa Hicrî bi boneya bidawîhatina Kongireya 15'ê a PDKÎ




**Hevalê birêz  Mesûd Tek sekreterê giştî ê PSK'ê, dost û hevpeymanê me ê birêz!**
**Heyeta rêzdar a Partiya Komeleya zehmetkêşên Kurdistanê!**
**Hevalên Saziya Xebata Kurdistanê!**
**Mamostayên birêz ên zankoyê!**
**Kadr û pêşmergeyên birêz!**
**Xûşk û birayên hêja!**
**Silavek germ li we be û ez bixêrhatina we dikim**

Her wek hûn dizanin kongireya PDKÎ li her çar salan carekê bi awayek asayî birêve diçe. Ew kongire yek ji kongireyên asayî bûye û bi xweşî ve bi serkevtin ve bidawî hat, wate jiber ku ew kongire bersivek serdemiyane bû bo xwast û daxwaz û tekoşîna evro a PDKÎ û sercem xelkê Kurdistanê, ew kongire hilgirê gellek mesajên serdemyane û rohn û giring bûn, ji berî her tiştî kongire li jêr diruşma hewildan bo yekrêzî li pêxema serkevtinê de birêve çû. Naweroka vê peyamê wate em wek PDKÎ serkevtina  PDKÎ li yekrêziyê de dibînin ku ew peyam eşkere dike, ku PDKÎ xwe ji bo rewşekê li Kurdistanê amade dike, ku tu partiyek deshilatê di destê xwe de qebze neke, belku paşeroja Kurdistanê, deshilata kurdistanê, û hikumeta Kurdistanê a xelkê Kurdistanê, bi hemû tex û qatên xwe ve ye.  Lewra peyama me yekrêzî û yekdengî ye ji ber ku em tev têde beşdar bin. Heke em dixwazin ku em hemû li deshilata dahatî a Kurdistanê de bi dengê xelkê xwe beşdar bin, tê vê wateyê ku bona amadekirina vê rewşê em hemû bona pêkhatina vê fezayê kar bikin, û hewlê jêre bidin.

Tu deshilat û tu partiyek nikare û civatên xelkê Kurdistanê îznê nadin ku bi tenê xwestek û daxwaziyên xwe bi ser xelkê de tehmîl bike, ku me bi wan bîr û bawer û lêkdaneweyên serdemiyane ew diruşm bo kongireya xwe hilbijartiye. Ew peyam tenê dirûşmek betal nine, belku ji çend mehan berî destpêkirina kongirê ve me hewil daye ku rewşek weha biafirînin, peymanek alîkariyê bi hevalên Komeleya Zehmetkêşên Kurdistanê re pêk bînin, ku bo yekem car li nav partiyên Kurdistana Îranê de hevpeymaniyek weha tê cîbicî kirin, û herweha peyama dostane û daxwzên me ên demokratîk ji wan hevalên ku çend saln berî niha ji PDKÎ cuda bûne, û amadeyiya PDKÎ bona diyalogê, û çareseriya kêşeyên evro bi awayek serdemiyane, nîşaneya wan bîr û baweriyên me  ne, û em bi erkê xwe dizanin ku gelek pêngavên din jî di vî warî de hilgirin, û herweha me çavnihêrî heye ku saziyên din ên siyasî, kesayetiyên şoreşvan û azadîxwaz pêşwaziya vê bangewazê bikin, bona vê em tev bikarin, komelekî demokratîk û deshilatek serdemiyane li pêşeroja Kurdistanê de bînne cî, bi tecrobe wergirtina ji tewaya wan şaşiyên ku li dîroka tevgera me de hebûne.

Peyamek din a Kongireya me ew bû ku em bi xelkê xwe û hevpeyman û hevalên xwe ragehînin, ku PDKÎ serbarê vê ku li jêr sîbera kar û tekoşîna kadr û pêşmerge û endam û alîgirên xwe de, li heyamê çar salên borî de serkevtin bi dest aniye, û pêngav ber bi pêşve avêtine, lê ew yek qet me razî nake, lewra me li vê beşê ji raporê ku li ser PDKÎ  bas dike, me gellek eşkere tekoşîna partiya xwe xistiye ber rexneyan, rexneyek bêrehmane, ji ber ku me jêve ye em dibe pitir kar bikin, divêt serdemiyanetir bin. Divêt proje û bernamên pêşkewtinxwazane ên zêdetir me hebin, bona gihîştina neteweya me bi armancên xwe ku çavnihêrî li me hene. Ya herî balkêş ewe bû ku ew peyam ku ji aliyê komîteya nawendî ve hate pesendkirin, û pêşkêşî kongireyê hate kirin, ji aliyê komîteya nawendî ve ku berpirsyarên beşên curbicur ên partiya me têde bûn hate qebûlkirin.

Li gorî derbasbûyiya ku ez li xizmeta xelkê Kurdistanê de bûm, dikarim bêjim ku ew karê partiya me li derheq kar û bernamên xwe, ne tenê li dîroka PDKÎ de, belkû li nav rêkxirawên Kurd ên Îranê, û heta dikarim bêjim ku li rojhilata navîn de jî bê hempa ye. Li vê raporê de me pesna xwe nekiriye, me serkevtinên xwe bi rûyê xelkê de nekêşane, belkû me bas ji kêm û kasiyan kiriye, û bi raya min ew şêwe rexnegirtina me ji xwe derwazeyek nû bi rûyê xelkê Kurdistanê de vedike.

**Beşdarên hêja!**

Em tev rêkxirawên Kurdistanî, û bi taybetî PDKÎ, wek civaka xwe, dema vê hindê hatiye ku li ciyê pesn kirina ji xwe, û rêznegirtina ji bîrûboçûnên cuda ku li civaka me de gellek zor e, li ciyê wan hemiyan de xwe rexne bikin, dema ku em rexneyan ji xwe digrin, ew yek tê vê wateyê ku hemû rastî li cem xelkê Kurdistanê ninin, li cem xelkê din jî ninin, wate em rêz digrin ji bîrûboçûnên cuda, hem li nav PDKÎ û hem jî li dervey PDKÎ.

Li heyamê heftiyek karê berdewam ê kongire, ew der cihek hêvîdarker bû bona binyatî kirina demokrasiyê li PDKÎ, zêdetir ji ya ku heye. Bîrûboçûnên cuda, selîqeyên cuda li ser komîteya nawendî, herweha li ser gelaleya bername û peyrewa navxwe a PDKÎ, bi awayek azad ketne ber lêkdanewe û cerahîkirinê. Min bîr ji vê dikir ku renge hinek ji vê xelkê ku çavnihêriya encama kongirê ne, dirêjbûna vê kongirê bi nîgeranî ve lê binêrin, lê ez li vir de bas dikim ku sedem ew bû ku behsek demokratîk bû ku hijmarek zêde ji beşdarên kongirê têde beşdar bûn, lewra raporek ku bo navê kongirê û bername û peyrewa navxwe a PDKÎ ku vê bê bilavkirin û dê bigîje destê xelkê û hevalên me, encama lêkdanewe û azadane û serdemiyane, a piraniya endamên beşdar li vê kongireyê de û lê vê rewş û hewayê de ye ku li kongirê de pêk hat.

Ew bîr û bawer û boçûna ku PDKÎ bûye alahilgirê wê, berhemek gellek dilxweşker a din ji min re pêk anî, ew jî ew bû ku piştî bas û gengeşeyan li hilbijartinek azad û demokratîk de, PDKÎ li vê kongirê de rêberiyek hilbijart ku hem kesên genc û ciwan hatne nav de, ku eva yek ji bernamên me ne ku kongire bi kongire, em rewşekê saz bikin li nav lawên xwe de, û qadê ji bo wan vekirî bihêlin ta ku bixwe tecrubeyan wergirin û bikevne gel kesên ku kar li gel wan bikin, bona vê ku bêne refa rêberiyê de, bibne gencên ezmûndîtî. Eva yek ji berhemên hilbijartinê bû, lê ya dilxwekertir ew bû ku PDKÎ nîşan da, ku ji bakûr heya başûra kurdistana Îranê bi xwe ve digre, jiberku pêkhateya rêberiya nû ji selmasê ve têde heye ta ku Kirmaşanê.

**Hevalên birêz!**
**Hemwelatiyên hêja!**

Me li kongireya Dr. Şerefkendî de tenê pêngavek hilgirtiye, lê ew rê tenê bi PDKÎ bi tenê nagîje dawiyê. Belkû rizgariya Kurdistanê û pêkanîna rewşek dilxwaz ku em hemû kar jêre dikin, û li vê riyê de bi dehan hezar qurbanî hatiye dan, hewcehî bi beşdariya tev xelkê Kurdistanê heye. Bê guman li vê riyê de erkê me girîngtir e. Em wek PDKÎ hest bi vê giringiyê dikin û kongireya Dr. Şerefkendî pêşerojek li pêşiya me vekiriye, û riyek nîşanî me daye, ku em li gor hêz û şiyana xwe, û rewşa siyasiya herêmê ber bi pêşve herin.

Lê li vê riyê de me hewcehî bi beşdariya hemû rêkxirawên siyasî ên opozisyona azadîxwaz ê Kurd ên Îranê û tev xelkê Îranê heye. Ji ber ku em li ser vê bawerê ne ku em nikarin azad bin, û nikarin ji detsê zordareiyê rizgar bin, jiber ku em bi hevre kar dikin. Xwediyên bîrûbaweriyên ayînî, demokrat, sosyalîst û her boçûnek din ku li Kurdistanê de heye, demekê dikarin boçûnên xwe ber bi pêşve bibin ku rewşek



**Doma R:2**

demokratîk pêk bînin ku em xelkê Kurdistanê xwediyê îdare û deshilata xwe a herêmî bin, û li Îranê de bikarin li çarçoveya yasayek demokratîk de wek hemwelatiyên din me li çarenivîsa neteweya xwe û welatê xwe de rol hebe. Lewra ew pêwîstiya bo alîkariyê bi singek vekirî û tehemolkirina bîrûboçûnên cuda li vî warî de, ji hemû demekê zêdetir xwe derxist. Dem jî gellek nemaye. Ew rêpêvînên ku li çend rojên borî li çend bajarên Îranê de û zêdetir bazariyan derheq rewşa xirap a aboriya Îranê birêve birin, peyamekê dide me, ku ew jî peyama hişyarkirinê ye û dibêje me ku dema tebayî û yekrêziyê hatiye û bûyer gellek ji vê bileztir diçne pêş ku li ser me rawestin ku bizanin em çi demekê amade ne.

Lewra divêt em bi micidî ve mijûlî xwe amadekirinê bin û ew xwe amadekirin jî hewcehî bi çandek nû heye. Heke em çi wek tak yan wek partiyên siyasî li hizra tolhildanê de bin, û xalên cuda li ber çavên me bin, yan em li hizra vê hindê de binm ku bi tenê li Kurdistanê de hemû kare bin, her ev yek dê bibe qedera me ku pêştir qedera me bû. Em bona vê ku bikarin ji wan guherînkariyên ku ji me tên çavnihêrîkirin ku gellek jî nakêşe, hewce ye ku em bihêz bin û hêz jî li yekgirtinê de ye. Peyama kongirê aliyê din jî heye ku ew jî ew bû ku me tenê bas ji kurdistanê nekirye, belkû Îran bi giştî ji me re girîng e, jiber ku her guherînek were pêş, berî hemiyan divêt li tewaya Îranê de were pêş. Lewra em derheq guherînkariyên Îranê jî bêxem nebûn.

Li vê kongirê de me ew peyama da hemwelatiyên azadîxwaz ên demokrat ku PDKÎ li pêxema yekrêzî û amadekirina projeyan bo Îranek demokratîk ku mafê tewaya neteweyan û girûpên ayînê bi hemû cudahiyan ve têde hebe, amade ye kar jêre bike herwek ku li rabihurî de me kar jêre kiriye, û ji niha ve







amade ne ku mayeyek zêdetir ji demên borî jî jêre danên, û li vê derheqê de destê alîkariyê bo tev azadîxwazên Îranê bi taybetî rêkxirawên azadîxwaz û pêşkevtinxwaz dirêj bikin.

Heke me bawerî bê vê heye ku li Kurdistana Îranê de tu partiyek nikare deshilata Kurdistanê bidestve bigre û qebze bike, herweha me bawerî bi vê heye ku ew serdem jî derbas bûye ku girûpek yan kesek li jêr her diruşmekê de carek din bibe hokarê zext û zordariyan bi ser neteweyên Îranê de, em bona avedankirina Îranek weha û bo Kurdistanek azad, divêt kar bikin û li vê derheqê de gellek mandînenasane kar dikin.

Dîhare ez naxwazim vê basê gellek dirêj bikim jiber ku li rapora kongirê de me bas kiriye, em bo vê pêşerojê çi li Kurdistan û çi li Îranê de me rê û cih diyarî kirine, û pêşniyar û bername me dane, û berî hemiyan bo PDKÎ. Hêvîdarim ku em bi beşdariya hemû aliyane bikarin vê riyê bipîvin û bikarin bi wan armancên ku malbatên şehîdan çavnihêrî hene û riha şehîdên me ji me daxwaz dikin, bigîjin û bi serbilindane şahidê bextewerî û asayiş û azadiyê li nan neteweya xwe de bin.

Carek din sipas bo beşdariya we, û hêvîdarim ku hevalên me li refa PDKÎ, û heval û hevalbendên me û rêkxirawên siyasî ên Kurdistana Îranê, û herweha azadîxwazên Îranê bi giştî rûpelek nû ji bername û bîrkirnê, û alîkariya demokratîk bi hevre hildin û tenê ew yek riya serkevtinê ye, û li dawiyê de bixêrhatina heyeta birêz komeleya zehmetkêşên Kurdistana Îranê dikim, ku li vê rêûresma me de beşdar in, û herweha carek din bixêrhatina tev rêkxirawên siyasî û mêhvanên birêz dikim, min jêve ye ku beşdariya we nîşaneya dostatita zêdetir, giraniyek zêdetir û hevpeymaniya zêdetir, bo lihevnêzîkbûn bi niyeta gihîştina bi wan armancan in ku min li vir de bas kir. Ez we hemiyan bi xwedayê mezin dispêrim û sipasiya we dikim, li jiyana we ya şexsî de hêviya selametiyê û li rêbaza azadiya Kurdistanê û hizbî de daxwaza serkevtinê ji we re dikim.

# Peyama rêzdar mela Hesen Şêweselî bo kongireya pazdê a PDKÎ



**Hevalên rêzdar, tev beşdarên kongireya pazdê a PDKÎ!**

Min ji kûrahiya dil ve rêz û hurmet ji we re heye, û hez ji dîtina we dikim. Ez gellek kêfxweş im ku di demekê de nûçeya destpêkirina kongireya we ya pazdê dibîsim ku elinda xebat û tekoşîna gelên herêmê geş û rohn û rohntir bûye, û telisma seherkerên vê herêmê yek li pey yekê pûç dibin, û piştî herifîna koşka hejmarek berçav ji sitemkarên ser topa vê cîhanê, yek ji xwînmijên herî kîneyî ên dîroka hevçerx, wate malbata cînayetkare Esed ber bi sernixûniya yekcarî, wek pêşengê hevalbendên nêzîk ên xwe, mijûle ber bi kirsdanka dîrokê ve diçe.

Ji vê demê hestyar de şanaziyê dikim ku partiya me, çi li astê navxwe û çi jî li pêwendiya bi hêzên Kurdistanî re li ser guhdarîkirin û diyalogê, ne wek tenazol û paşekêşe, belku wek huner û mentiqek bi bandor, pêdagiryê dike, ku ez li wir de curetek baş li pişta vê helwesta cesurane de hest pê dikim.

Ez xatircem im ku partiya me li asta navxwe de gihîştiye vê encamê ku lihevnêzîkbûn bi armanca destveanîna poanên takekesî, xwe guheşîn bo gihîştina bi kopka deshilata rêkxistinî, bi heman armancî, û dîsan nêzîbûna bi hevudin bi armanca poanên modelek nû, li aliyê din jî hereketên bêçine û bê lêkdanewe û girêbestên ne mentiqî, û hereketên nimayişî, tu yek ji wan nikarin nusxeyên şefaîner bin.

Hemû aliyek vê yekê bi rohnî dizanin ku bi kurdî û bi kurtî, diramatîzekirina bûyerên biçûk û ne giring, Romantîzakirina rastiyên tal, debil standardbûn, yan banek û duhewa bûn, siyaset bi hevre kirin û bikaranîna stayla du pêwaneyî ji bilî alozkirina pêwendiyan, û şikest û nakamî, tu encamek wê tunabe.

Ez xatircem im ku partiya me wek demên borî, kerbvebûna ji yektir û ji yek veqetiyan, mifahwergirtin ji siyaseta ji hev veqetiyan wek sîlaheke îstitarkiriye sitratîjîkî a lêdan û têkdan û tirşkirina zewq û hezkirina cemawerê Kurdistanê bi hêla sor dizane. Em des bi doa ne ku partiya me mêtodek weha danê û sitaylekê biafirîne ku şûr û şemşîra duserî a birr birrkirinê hêzek weha têde nemînê, hekî ne birînên kevn wê dîsan bikelin.

Em çavnihêr in karek weha bihê kirin ku ew çeka jengawî li tarîtiya dîrokê de, toza heta hetayî li ser ronê. Bona vê ku zortir bikarin bo destvanîna aştiya rastîn û yekrêzî û hevdengî û hemahengî û sergirtina xewn û hêviyên belengazên Kurdistanê, pêngavên rohn û şefaf bên hilgirtin. Me hemiya baweriyek kûr bi vê yekê heye ku tarîtî û mij û dûman herçend berfireh, û çirr be, nikare ronahiya meşxela hêviya azadîxwazên Kurdistanê bixendiqîne.

Şerwanên cesûr ên evro li qada berxwedaniya dijwar de, mîratgirê wan pehlewanan in ku qada şerê di navbera heq û neheq û tarîtî û ronahiyê de, wek vê ku qumek avê bixon, li ber çavê me hemiyan dilxwazane û xobexşane, şerbeta nemanê vexwarin û min jî serê xwe li ber xaka li ber piyên wan danî. Heta dayîkên cergsoz ên Kurdistanê li ser rewane kirina deste deste ya gulên hêviyên xwe bo qada germ ya şer li Kurdistanê weha pêdagir bin, alaya xebata Kurdatî û mêratiyê wê her bilind bimîne.

Silav ji aştiya rastîn û bê girê, serkeve kongireya pazdê a PDKÎ. Serkeve xebata sext û xûnîn ya gelên Sûriyê û tewaya gelên wê cîhanê, hiloşe komara Îslamiya Îranê, na bo dujminatî û veqetiyanê.

**Mamosta Hesen Şêweselî**
**08.09.2012**

# Daxuyaniya bidawîhatina kongireya 15'ê ya PDKÎ

**Hemwelatiyên hêja!**
**Xelkê azadîxwaz ê Kurdistanê!**

Kongireya 15'ê a PDKÎ roja şemiyê 8' Rezbera 1391'an a Rojî bi beşdariya endamên kongirê û hijmarek mêhvanan dest bi karên xwe kir. Kongireya 15'ê a PDKÎ li pêvajoya asayî a kongirê û organîzasyona demokratîk a PDKÎ, li dema xwe û li gorî pêrewa navxwe a PDKÎ birêve çû.

Li rêûresma vekirina kongirê de peyama vekirina kongirê ji aliyê rêzdar Riza Xeyatî ve hate pêşkêşkirin. Piştî pêşkêşkirina rapora komîteya amadekar a kongireya 15'ê, birêz Mistefa Hicrî rapora komîteya nawendî pêşkêş kir û têde pêşniyar hatibû kirin ku kongireya 15'ê li jêr navê kongireya Dr. Şerefkendî û li jêr diruşma hewildan bo yekrêzî li pêxema serkevtinê de nirêve here, ku ji aliyê endamên kongirê ve hate pesendkirin.

Li rojên birêveçûna kongirê de destpê rapora komîteya nawendî bo kongireya pazdê kete ber bas û endamên kongirê bi awayek berşav û çalak hemû aliyên raporê lêk dan, û di behs û gotûbêjek vekirî û azad de, kongirê sê rojên berdewam li ser vê raporê kar kir û li dawiyê de ji aliyê kongirê ve hate pesend kirn.

Rapora komîteya nawendî tevî giringîdan bi siyasetên cîhanî, û binemayên guhertinên siyasî û aborî, û pêwendiyên li cîhanê de bas ji bandora wan guherînên cîhanî li ser Rojhilata Navîn kir, û têde tevî berhevdanek hûr û hemî aliyane ên bakûra Afrîqa û rojhilata navîn, bi geşbînî ve çav li bizavên rûxana dîktatoran û beşdariya xelkê




li dîharîkirina çarenûsa xwe de kiribû.

Li beşek din ji raporê tevî nirxandina hemû aliyane a rewşa siyasî, aborî, civakî û çandî a Îranê rejîma Îranê wek rejîmeke ber bi lawazî û bi tenê mayî hatibû nasîn û têde tevî rexnegirtina ji opozisyona rejîma Îranê ku nekariye yekrêz û yekgirtî be, pê li ser pêngavên bi kiryar ên zêdetir li vê derheqê de dagirtibû.

Piştî behsa li ser raporê bas ji rewşa Kurd û Kurdistanê û guhertinên di vê derheqê de hatibû kirin, û hêvîdariya bi ber bi pêşve çûna rewşa pirsa Kurd hatibû nîşan dan.

Piştî behsa li ser rapora komîteya nawendî ku bi awayek demokratîk û îroyîn rexne li karûbarê hizbê û rêberiyê girtibû, pêşniyar ji bo çareseriya arîşeyan xistibû ber bas.

Piştî vê karê kongirê baskirina li ser bername û pêrewa navxwe a PDKÎ bû, ku lê vê beşa kar de endamên kongirê bi awayek çalak li bas û diyaloga çaksazîxwazane de beşdar bûn û piştî çend roj karê berdewam bername û peyrewa PDKÎ jî hate pesendkirin.

Li beşek din a pêvajoya karê kongirê de, komîsyonên peyam, sikala û biryaran, raporên xwe dan û biryar û rasipardeyên pêwîst ji aliyê kongirê ve hatin pesendkirin.

Hêjayî basê ye ku li naweroka karê kongirê de hijmarek berçav ji peyamênkesayetî û rêkxiraw û layenên bîhanî û Îranî û Kurdistanî, ko bo kongirê hatibûn şandin, pêşkêş bi kongirê hatin kirin.

Xalek din a giring a kongireya 15'ê a PDKÎ beşdariya hijmerek mêhvanên dervey PDKÎ bûn ku ji kesayetiyên pispor û şareza yên zanistî pêk hatibûn û li pêvajoya karê kongireya Şerefkendî de bi pêşniyar û têdîtinên xwe karîn alîkarê pêşveçûna baştir a karê kongirê û pirr naweroкbûna basên kongirê bin.

Beşa dawiya karê kongirê pêk hatibû ji hilbijartina rêberiyek nû ku li rewtek demokratîk û azad de, hijmarek endamênkongirê ku xwe ji bo endametiya rêberiya PDKÎ berbijar kiribûn û li encam de heşt kes li derveyî welat û 25 kes li Kurdistanê wek endamên rêberiya PDKÎ hatin hilbijartin û erkê birêvebirina siyaset û rasipardeyên kongireya pazdê a PDKÎ girtne stûyê xwe. Li roja dawiya karê kongirê de komîteya nawendî hilbijartiya kongireya 15 li yekem pilînoma xwe de hevalê rêzdar Mistefa Hicrî wek sekreterê giştî ê PDKÎ hilbijart û bi kongirê da nasandin.

Hemwelatiyên hêja!

Kongireya PDKÎ li rewşek geşbîn bi bûyeran û guhertnna birîve çû, û tevî nirxandina hemû aliyane a rewşa evro dilxweş bi piştevaniya xelkê Kurdistanê ji partiya hezkirî a xwe, wate PDKÎ li ser erk û wefadariya PDKÎ bi rêbaza demokratîk û netewî û xebatkarane pêdagirî kiriye û peyama yekrêzî arasteyê rêkxiraw û aliyên siyasî ên Kurdistan û Îranê kiriye û komîteya nawendî a PDKÎ hilbijartiyê kongireyek weha tevî pêdagiriya li ser pirensîpên netewî û demokratîk ên xwe bi erkê li ser milê xwe dizane ku li pêxema gihîtina bi armancên neteweya Kurd û neteweyên Îranê, hem xebata çirrtir û hem jî pêngavên bi kiryartir bona yekrêzî û jewpêwendiyên demokratîk hilgire û peyama wefadariyê ji bo tev azadîxwazên Kurd û malbatên şehîdan û girtiyên siyasî ên Kurd û tev girtiyên siyasî ên Îranê û herweha peyama pîrozbahiyê ji bo endam û alîgirên PDKÎ li her cihek vê cîhanê dişîne.

**Yekrêz û qahîmtir be refa xebatkarên Kurd**
**Serkevtin ji azadîxwazên Îranê re**
**Neman bo komara Îslamiya Îranê**
**Komîteya Nawendî a PDKÎ**
**17.07.1391**
**08.10.2012**

## Biryarnameya kongireya 15'ê a PDKÎ



Kongireya 15'ê a PDKÎ Kongireya Şerefkendî, tevî pesendkirina hejmarek biryar û hinek rasipardeyan, bo rêberiya hilbijartî a vê Kongirê bi armanca pêngavhilgirtina ji bo cîbicîkirina wan, siyaseta rêberiya hilbijartiya kongireya çardê a PDKÎ, derheq diyaloga tevî wan hevalên ku şeş sal berî niha ji refên PDKÎ cuda bûn, û herweha wajokirina rêkevtinnameya bi Komeleya Zehmetkêşên Kurdistana Îranê re, pesend kir, û dirêjîdana bi vê pêvajoyê xiste stûyê rêberiya nû a PDKÎ.

Herweha hewildan bo nêzîkî û alîkariya bi partî û aliyên siyasî ên Kurd li Kurdistana Îranê û domandina gotûbêjan bi partî û aliyên siyasî û kesayetiyên azadîxwaz û demokrat ên opozisyona Îranî re, wek erkê rêberiya taze hilbijartî a Kongireya pazdê hate destnîşan kirin.

## Peyama birêz Riza Xeyatî di dema vekirina kongireya 15'ê a PDKÎ de



**Beşdarên birêz!**

Ez Riza Xeyatî kadrê kevnar ê PDKÎ kêfxweş im ku piştî 32 sal xizmeta bi tevgera neteweya Kurd û PDKÎ, şanaziya vekirina kongireya 15'ê a PDKÎ bi min hate dan, bitaybet wek azadîxwazekî Turk ê Azerî, xelata zehmetên salên borî li refên PDKÎ, wek wefadarî û rewabîniya bo vî karê hêja werdigrim.

Bawer bikin ku ew demên xweş ne tenê ez ji bîr nakim, belkû min han didin ku demên mayî ji jiyana xwe jî her di vê riyê de derbas bikim û heya min hêz û şiyan hebe xebata xwe bidomînim.

Ez tevgera netewî a Kurd wek tevgerekî heqxwazane dizanim ku taybetmendiyên PDKÎ ez û ên wek min ber bi aliyê xwe ve kêşane. Ez ji rêberên PDKÎ gellek hîn bûme û min yad û bîra Qazî, Qasimlo, û Şerefkendî li dilê xwe de zindî hêla ye. Ez bi hevçeperiya bi we tewayan re şanaziyê dikim.

Ez hêvîdarim ku kongire bi deskevtên zêdetir ve pêngavan havêje, û li hevpêngaviya bi neteweyên din, bi taybetî Turkên Azerî re serkevtî be.

Tevî pîrezbahiya ji we hemiyan û neteweya Kurd serkevtina zêdetir ji kongireya we re hêvî dikim, û ji vê lutfa ku we derheq bi min kir, gellek siapasdar im.

**Tevî sipasiya dubare**
**Pêşmergê kevnar ê PDKÎ Muhendis Riza Xeyatî**

# Îran di Sûriyê de çi dike

W ji Îngilîzî:
Muitesem Nûranî

**"Bûna Sipaha Quds li Sûriyê belgeya haşahilnegir ya piştevaniya Îranê ji rejîma Beşar Esed e".**

Heta wan dawiyane jî destêwerdana leşkerî ya rejîma Îranê li Sûriyê de li jêr perdeya şik û gumanê de hatibû veşartin. Gellek kes jêre pirsyar bû ku gelo tu bêjî rejîma Îranê li nav karûbarê Sûriyê de destêwerdana leşkerî bike?

Dema ku havîna borî televîzyona Elerebiye dîmenê wan 48 Îraniyên ku li nêzîk bajarê Dîmeşqê ji aliyê arteş Azad ya Sûriyê ve bi dîl hatibûn girtin nîşan dan, berdevkê erteşa Azad ragerhand ku ew kesane bi giştî endamên sipaha Pasdaran a rejîma Îranê ne.

Ew kesane hinek xerîte û belgeyên sipaha Pasdaran ji destê wan hatine girtin û heta ew yeka jî got ku ev kesane zêdetir ji 150 kesî bûn bo komkirina zanyariyan hatine û hewkariya rejîma Esed dikin.

Lê karbidestên rejîma Îranê haşa ji vê yekê kirin û dibêjin ku ew kesane ziyaretkerên Îranî ne û ji bo ziyaretê hatine, û palpiştiya rejîma Îranê bo Sûriyê tenê li çarçoveya malî û exlaqî de ye.

Bi her hal li wan çend mehên borî de guhertinên berçav li rabûn û rûniştina karbidestên Îranê de berçav dikeve û amadebûna hêzên Îranê li Sûriyê de nîşan dide. Roja 16'ê Îlona 2012 Mihemed Ceiferî fermanderê Sipaha Pasdaran ragehand ku Sipaha Quds ku baskê Sipaha Pasdaran e , bona çalakiyên leşkerî li derveyî sînorên Îranê niha li Sûriyê de ye. Herweha ragehand ku ew yek nayê vê wateyê ku li Sûriyê de destêwerdana leşkerî bike, ew hêza tenê bi armanca rawêjkarî û yarmetiya wî welatî li wir e.


Her çend roja paştir Ramîn Mêhmanperest berdevkê wezareta karê derve a Îranê got ku axavtinên Ceiferî bi tu awayekî bi wateya amadeyiya leşkerî ya Îranê bona destêwerdana nav karûbarê herêm û Sûriyê de nine,li nav axavtina karbidestên rejîma Îranê cudahiyek berçav heye.  wan siyaseta lêdana li nal û bizmar herduyan girtine pêş, û bi qewlê xwe zîrekatiyê dikin, lê nizanin kê wê her tişt zû eşkere be.

Her piştî vê yekê Îsmaîl Qaanî cihgirê fermanderê Sipaha Quds li gotûbêja bi nûçegihaniya Îsna re ku beşek ji vê gotûbêjê guherî ye dibêje, heya wê demê emli Sûriyê de nebûn, kuştara xelkê ji aliyê opozisyonê ve gellek zor bû, lê bi amadebûna rejîma Îranê bi awayê fîzîkî û ne fîzîkî, me pêşiya wan kuştaran girtiye.

Li gor nûçegihaniya Roytérz ku roja 20'ê Îlonê nivîsand, kopiya rapora nihênî ya yek ji rêkxirawên îtilaatî ên rojawayî ketiye dest wan, bas ji hewkariya leşkerî û teslîhatiya rejîma Îranê bo Sûriyê dike. Royterz li gorî vê rapora nihênî dinivîse ku Îran ji riya Îraqê ve û biriya balafirên medenî, rojane dehan ton çek û teqemeniyên leşkerî û gellek endamên Sipaha Pasdarn dişînme Sûriyê.

Li gorî nûşeyan Îran bona hinardeya çek û teqemeniyên leşkerî ji Îranê ve bo Sûriyê bi armanca teyarkirina hêzên Esed, bo piştevaniya ji hêzên wan bo tepeseriya zêdetir ya neraziyan mifahê werdigre.

Ji aliyekî din ve renge wezareta karê derve a Îranê  ew hereketa Sipaha Pasdaran gellek pê xweş nebe, ku Îran li Sûriyê de destêwerdana leşkerî dike û ji vê yekê nerazî ye ku nebe ew kiryara Sipaha Quds encamek nebaş, li pey xwe  re bo Îranê hebe, lê Sipaha Pasdaran bo xwe biryara xwe di vê




derheqê de dide, û li çarçoveya siyaseta Wezareta Derve de naçe pêş.

Ew tewaw siyasetek cuda ye, ku ji aliyekê Sipah destêwerdana leşkerî li nav Sûriyê de dike, û ji aliyek din ve wezareta deerve a Îranê bi awayek sîstimatîk dixwaze navbeynkariyê di navbera hikumet û opozisyona Sûriyê de bike.

Li gorî nûçeya Wall Street  Jornal  di wan çend rojan de sertîp Husên Hemedaniyan ku jineralekî kevnar e, şandiye ji bo çavdêriya karê Sipaha Quds li Sûriyê de. Lewra ew hilbijartine .

jiber ku kesekî xwedî ezmûn e, hem li şerê ran û Îraqê de û hem jî li serkûta tevgera Kurd li rojihilatê Kurdistanê de ku li dehka 60 û 70'î di holê de bû, ji aliyekî din ve Hemedaniyan berberkaniya vê şoreşa mexmelî kir ku piştî hilbijartinên sala 1388 li Tehran û bajarên din de serî hilda.

Herçend Hemedaniyan ezmûna tepeserkirinê heye lê rewşa Sûriyê gellek ji vê xiraptir e ku bi kuştarê were kuntrol kirin. Jiber ku li gel vê ku Îran tewaya hêza xwe bi kar tîne, bona vê rejîma Beşar Esed nehiloşe, û bereya berxwedaniyê bihêz bike, opozisyona Sûriyê jî rojbiroj bihêz dibe, ew jî li riya Turkiye û Erebistana Seudî û Qeter û welatên din ên kendavê ve çek û teqemeniyên modern ên şer bi dest dixin, bi vî halî ne tenê Îran ne tenê alîkariya arambûna rewşa Sûriyê nade belkû rojbiroj rewşa navxwe a Sûriyê xiraptir dibe.

Tevî wan hemiyan jî Îran bi vê sanahiyê nasekine, ji ber ku Îran li ser vê bawerê ye ku sînorên wê gelek ji vê yekê berfirehtir e ku bi çav tê dîtin, ew her li destpêka şoreşê pêve dibêjin ku divêt sînorên coxrafiyayî nemînin û sînorên îdeolojîkî bêne avakirin û şoreşa Îslamî bo derve dişnin.

Bi taybet ku Sûriye beşek ji hilala Şîe ye, û ew hîlala Şîe ku piştî nema Sedam pêk hat û Şîeyên  Îraq, Lubnan û Sûriyê bi xwe ve digre, divêt were parastin.

Jiber ku Sûriye ji Îranê re gellek girîng e, hem pira li navbera Hizbullaha Lubnan û girapên binajo ên din, û hem pira navbera Îran û cîhana Ereb e, û hem jî cînarê Îsraîlê ye, tevî vê yekê jî Îran ji vê nîgeran e ku ew rewta ku bi Buhara Erebî naskirî ye, û li Tunis, Lîbî, Mîsr û Yemenê de serî hilda û piştre gihîşte Sûriye, piştre goviya Îranê bê.

Ji aliyek din ve jî bi nemana Sûriyê pereke Îranê dişkê û bi herifîna vê pirê, bereya Moqawimet têk dişkê, û li her warekî de zirar ji Îranê re heye. Îran gellek ji vê pêvajoya Sûriyê nîgeran e.

**Çavkanî:**
**www.forignpolicy.com**
**www.wsj.com**

# Peyama Xatû Nesrîn Qasimlo bo kongireya 15'ê a PDKÎ



**Xortên Neteweya Kurd!**
**Hevalên PDKÎ!**
**Hevalên rêzdar!**

Kongireya we ya pazdê hat û ew yek jî selmînerê vê rastiyê ye ku PDKÎ li ser xebata xwe berdewam e, û eva jî bûye sedema dilxweşiya neteweya Kurd û herweha dilxweşiya min.

Neteweya Kurd ku pitir ji 33 sal e li jêr deshilata bêrehmane a Axûndsan de êş û azarê dikişîne, hêvî bi we heye, ji ber ku ji bilî we xortên xebatkar tu kesek din çinine.

PDKÎ bi dirêjahiya dîroka pirr ji şanazî a xwe evraz û nişîvên zaf birrîne, lê li hemû demekê de gellek pêdagirane berbirûyê astengan bûye û her dem amade bûye û xebata xwe ber bi pêşve biriye.

Sirûda neteweyî a Kurd dibêje: " kes nebêje kurd mirî ye Kurd zindî ye". Her kurdekî welatperwer bi serbilindî û çavê pirr ji rondik ve vê yekê dibêje.

Vê yekê dizane ku hemwelatiyên wê bi xwîna xwe dara hebûna neteweya xwe avdanî kirine, û neteweya wê çiqas azar kêşaye.

Her kurdekî welatperwer şanaziyê bi rabihuriya netweya xwe dike, û li hemen dem de xebatê bi tenê riya azadiyê dizane.

Vê yekê dizane ku armanc ji xebatê rizgariya nîştiman e, û li vê niştimana rizgarkirî de berçavgirtina mafê mirov yek ji bingehên sereke ê demokrasiyê ye, û dema vê hatiye ku nexwendewarî û kêmxwendewarî bê binbirr kirin, ji bona vê ku ew diradeyên kirêt çi did ema xebat û çi di dema aştiyê de dibe astenga li ser riya serkevtinê.

Hûn xortên xebatkare Kurd hêvî û awata nifşên pêşiya xwe û xelkê belengaze xwe ne. Hûn mîratgerên rêberên jêhatî û xebatkar ên fîdakar in.

Ev mîratê giranbuha hem cihê şanaziyê ye û hem jî sedema pirr nawerokbûn û kûrbûna xebata rizgarîxwaziya we ye.

Kongireya we pirr nawerok be
Serkevtî bin

**Nesrîn Qasimlo**
**06.07.2012**

# Şerê deshilatê û rewşa Refsencanî



N: Teqî Rûzbêh
W: Rûken

Destpêka qonaxeke pirr ji evraz û nişîv, ku bi awayek berbiçav bi destbiserkirina zarokên Refsencanî dest pêkir.

Jêhelçûna stêrka bextê Ehmedînijad, pêvajoya kontrol û kêmbûna hêz û deshilata dezgeha birêveberiyê, bûye sedema pêkhatina rewşekê ku bandên rikeber li pêkhateya deshilatê de hewil didin ku her yek ji wan beşek zêde bi dest bixe, û her ji niha pêve wajoya xwe li ser pêvajoya qonaxa hestyar heta hilbijartina li pêşiya me ya serkomariyê bide.

Li vê rikeberiya çirrkirî de piyê Xamineyî, Refsencanî, Eniya yekgirtî ya Paydarî û bitaybetî usulgerayên sunnetî li holê de ye, ku her yek ji wan hewlekî bêqas dane bona vê ku hevçax her sê dezgehên birêveberî, dadwerî û yasadanînê bi destve bigrin.

Hewildan û kiryarên curbicur bona amadekirina qada hilbijartina serkomariya Îranê bo du lîstikvanên berbiçav û pêkanîna rewşa hewce bo pêşîgirtina ji her cure hatinek pêşbînînekirî wek mêhvanek nexwandî, her ji niha ve dest pêkiriye. Ew du aliyên mezin û berbiçav jî di rastî de Eniya Paydarî û usulgerayên sunnetî ne, ku niha jî dezgeha dadwerî û parlemento di destê wan de ye.

Pêdagiriya li ser rolê Mêhdî Haşimî li raperîna sala 1388'an de û destbiserkirina wî hilgirê wî peyamî bo Refsencanî ye ku xwe ji her cure destêwerdana li nav şerekê de ku li ser qorixkirina dezgeha birêveberiyê û parvekirina deshilatê ye dûr ragirin, û qadê ji bo rikeberên sereke vala kin. Li pirsa rikeberiya bi Refsencanî re her hemû wate rêberî ( û Eniya Paydarî) û aliyê binajoxwazên sunnetî hevhizr in. Lê her yek ji wan li gor dîtingeha xwe ya taybetî û li ser rikeberiya bi hevre hewil didin, mifahê jê wergirin.

Helbet Refsencanî bi kiryar hêz û giraniya gefxwarinê tuneye, lê bi baldan bi valahiya heyî ya çavkanîgirtî ji têkşikana siyasetên hakim û bihêzbûna kirîzan, û zextên navnetewî ku îmkana tevlîhevbûna hewkêşeyên niha û tehlûkeya ji kontrolê derketina wî, nîgeraniya ji rolê bihêze wî zêde dibe.

Nabe em ji bîra xwe bibin ku ew li gorî

Tecrobeya sala 1388'ê bi baldan bi keleke bûba kirîzên curbicur li ser yek, ku pêşîra wan girtiye û bi taybetî faktora zext û givaşê û pîlana hêzên mezin ji bo bandordanîna li ser bûyerên navxweyî ên Îranê, ew wek kesê margestî ji kindirê reş û sipî ditirsin. Li wê kirîzê de ji aliyekê Xamineyî heye ku riftarek taybet û dualî bi Refsencanî re heye: ji aliyekê ve hewcehî pê heye, û niha zêdetir ji her demê bi sedema vê ku ew wek yek ji bingehdanerên rejîma wan û kesê cihê bawera Xomêynî xwediyê nifûzek berçav li nav hinek beşên ruhaniyên xeyrî dewletî û yan jî kêmtir dewletî û wek kesek xwedî ezmûn heye, her niha jî li nav hinek ji beşên borokrasî û karsazên dezgeha berfireh ya îdariya rejîmê xwedî nifûz e.

Herweha ew kesek e ku di nav hinek ji welatên Erebî ên derdorê de xwedî hitbar e, û li çareserkirina kêşeyên baskên curbicur di nav deshilatê de jî ezmûnek baş heye. Ji aliyek din ve Xamineyî xwazyarê hebûna Refsencaniyeke bêhêz û bê rêkxistin e ku nexwaze û nikare jî li ser riya hêz û deshilata wî ya reha astengiyan saz bike.

Her eva ku me dît Xamineyî ji aliyekê ve ew ji serokatiya Meclîsa Xibrigan xist û ji aliyek din ve ew li posta serokatiya Korra Dîharîkirina Qazanc û Berjewendiya Nizamê de ragirt, Her bi vê sedemê ye ku heke em dibînin ku Xamineyî nahêle kes bi awayek rasterast êrîşî ser Refsencanî bike, lê ji aliyek din ve pêşiya şandina zarokên wî bo girtîgehê nagre.

Heke em bîr ji vê yekê bikin ku şikesta bernamên Ehmedînijad li warên aborî û siyaseta derekî de, tê wateya şikesta siyasetên Xamineyî û lawazbûna otorîteya wî jî, jiber ku ew piştevanê sereke yê siyasetên dewletê ye, û li wir de ye sedema bingehîn ya dijayetiya bi Refsenacanî re eşkere dibe. Lê her çi be Xamineyî hewcehî bi Refsencaniyeke kontrolkirî û li jêr çavdêriya xwe de heye, bi taybetî ji bo rikeberiya bi kirîzan re. Li vê derbarê de usulxwazên sunnetî jî razî bi Refsencaniyeke weha ne ku tenê roleke çareserker hebe.

# Bîranîna şehîd Ebdulla Şerîfî

Roja 16'ê Rezbera evsal hejde sal bi ser şehîdbûna hevalê tekoşer û fîdakar, şehîdê serkirde Şehîd Ebdula Şerîfî re derbas bû. Di vê rojê û li sala 1373'an, di demekê de ku desteyek ji kadr û pêşmergeyên komîte şaristana Mehabadê a PDKÎ ji bo karê rêkxistinî û siyasî li halê geştek siyasî de bûn li navbera gundên Kuran û Kawlana serê li Derawa Şekrawê ketin kemîna dujmin û her li yekem destrêja kirêgirtî û caşên rejîmê de mixabin hevalê xevatkar Ebdulla Şerîfî endamê Komîteya Nawendî û berpirsê komîte Şaristana Mehabadê şehîd bû.



Muitesem Nûranî

Şehîd Ebdulla yek ji wan serkirdeyên şoreşvan û jêhatî bû ku baweriyek kûr bi xebata rizgarîxwazane a neteweya Kurd hebû. Gellek caran digot hêviya min ew e ku Kurdistan rizgar be û azadiya gekê Kurd li rojhilata Kurdistanê bi çavê xwe bibînim, her wek li beşek ji jiyannameya xwe de di vê derheqê dibêje: “ herçend ku jiyan xweş e, lê dema ku hewce be em ji jiyana xweş ya gel re amade ne ku bimrin. Gellek min hêvî dikir ku rojekê ez li nîştimana xwe û nav gelê xwe de bi azadî û serbestî bijiyabam û min rizgariya gelê xwe bi çavê xwe bidîta”.

Şehîdê serkirde herçend ki bi temen ciwan bû, lê kadrek xwedî ezmîn li qada xebatê de bû, wî dizanî ku dîrokê çi erkek giran xistiye ser mila, lewra bi berdewamî mijûlî xwendin û jêhelbirina zanyariyên siyasî ên xwe bû. Li gel vê ku kadrek jêhatî ê rêkxistinî bû hewkariya beşa ragehandina hizbê jî dikir û gellek gotarên siyasî û edebî ên pir nawerok û rojnama Kurdistan û Radyo dengê Kurdistana Îranê dinivîsî.

Bi şehîdbûna wî PDKÎ yek ji kadrên herî jîhatî li asta rêberî û siwarşakekî qada xebat û tekoşîna rojên dijwar ên xebatê ji dest da. Û kadr û pêşmergeyên PDKÎ yar û yawerek dilsoj û mandînenas ji dest dan.


Di rastî de ew yarê hejaran û hêviya hejarên gund û bajarên Kurdistanê bû, û xwezaya bilind û taybetmendiyên wî dilsojî û cesûriya şexsî û exlaqî, û serahet û pakiya wî nîşan dida.

Wî qet ji riya rast la neda, û dijî boçûnên çewt û ne rast bû, ku dixeast partiya wî ji rê derxe yan xisarê bi piristîja partiya wî bigehîne. Her wek ew li jiyannameya xwe de dibêje: “ her kes ku ji min hez dike, daxwza min ew e ku ji PDKÎ hez bike, û riya demokrat bigre pêş”.

Wî serbarê vê ku bawerî bi rizgariya netewî hebû û li pêxema armancên xwe de canê xwe gorî kir, li dema xizmeta bi tevgera Kurd jî kadrek cihê bawera hevalên xwe bû. Bi xwe û bi exlaqên bilind ên xwe, cihê xwe li nav dilê wan de kiribû, jiber ku gellek birayane û dilsojane li gel kadr û pêşmergeyan riftar dikir.

Gelek kesan her tiştê xwe li cem wî bas dikir û wek hevalû xemxwarê xwe lê dinêrî. Tevî vê yekê jî taybetmendiyên bilind wî ew qas zaf in ku nayên hijmartin.

Em serê rêz û hurmetê jêre ditevînin û her dem ew di dilê me de dijî, û arman û boçûnên wî û tev şehîdên me, meşxel û çiraya riya tekoşîna me ne.



Şehîd Ebdulla Şerîfî

www.arsivakurdi.org

Agirî 7
Hejmar 192, 9'ê Çiriya Pêşîn a 2012

# Komara Îslamî di navbera êrîş û gefan de



Arif Vêlzî

Hevdem digel belavbûnan nûçeya egera êrîşa leşkirî ya Îsraîlê bo ser Îran û binkeyên etomî ên vî welatî, û hevdem digel birêveçûna mezintrîn manora deryayî a bi fermandeyiya Amerîkayê û bi beşdariya pitir ji sî welatên cîhanê di nava avên Kendavê de û herweha piştî gotinên balyozê Amerîkayê li ser Îsraîlê li dor egera êrîşa leşkeriya Îsraîlê bo ser Îranê û ji aliyek din ve, hereketên siyasî û leşkerî ên Amerîka û Îsraîlê li nav welatên cîran ên Îranê û komek belgeyên din, bûne sedema vê yekê ku berpirsiyarên payebilind ên siyasî û leşkirî ên Îranê, di ragehandinên giştî de, dijkiryarên tund ji xwe nîşan bidin.

Mihemed Elî Ceferî, Fermandeyê Supaya Pasdarên Komara Îslamî di gotinek xwe de ragehand ku dibe em hemû bo şer digel Îsraîlê amade bin û herweha em dizanîn ku dujminatiya digel Îsraîlê bi tenê li riya şerê leşkerî bi dawî tê.

Nîgeraniya Îsraîl, Amerîka û bi giştî welatê rojavayî li dor pirograma navikî ya Îranê di vê yekê de ye ku hekî bêt û Komara Îslamî çeka etomî berhem bîne, bê guman dibe sedema pitir yaxîbûna wê li hember civaka cîhanî û navendên navnetewî û herweha eva jî dibe sedema serhildana pêşbirkêya berhemanîna çeka navikî li navbera welatên herêmê de.


Hinek ji şarezayên karûbarên siyasî û leşkerî li ser vê baweriyê ne ku heya destpêkirina helbijartinên serkomariya Amerikayê, Îran dikare bi dana bersivek erênî bi Obamayê li dor pirograma etomî ya xwe, şansê xwe yê dawî taqî bike û di vî haletî de jî Obama dikare piştî helbijartinan eger cardin bo vê postê hat helbijartin, hemû hewla xwe bide bo pêşgirtin ji egera êrîşa leşkirî ya Îsraîlê.

Lê weke xûya dike haya niha rejîma Komara Îslamî tenê gotubêj ne bo çareseriyê, belkû bi merema kirrîna dem bi kar tîne, û herweha pêka vê yekê ku Netanyaho piştî vê yekê ku Obama amade nebû hêla sor bo pirograma navikî ya Îranê bikişîne, bi xwe li korra Giştî ya NY de, ev hêla sor bo pirograma etomî ya Îranê diyarî kir, pir zehmete ku rejîma Tehranê bersivek erênî û cihê hêviyê bide civaka cîhanî.

Lewma hekî gefên Îranê, şerê leşkirî lê bikeve, bêguman berpirsyarê sereke yê vî şerî ku encama wê her tiştek be, rejîma Komara Îslamî ya Îranê ye ku bi siyasetên xwe ên tevdanîkarane û destêwerdana di nav karûbarên welatênheremê û guhnedan bi civaka cîhanî li dor pirsa etomî ya xwe, rê ji şerek weha re xweş kiriye.



# Dayîka pêşmergeyek PDK Îranê li Urmiyê Koça dawiyê kir



**Roja 7'ê Çiriya Pêşîn a Sala 2012'an, xanima "Nêrgiz Qasidî Fer" Dayîka "Weysî Mendan", Pêşmergeyê PDKÎ di temenê 64 saliyê de li gundê Rajana Urmiyê de koça dawiyê kir.**

Xanima Nêrgiz, jinek nîştimanperwer bû û tim di jiyana xwe de şanazî bi vê yekê dikir ku kurek wê pêşmergeyê PDKÎ ye û ji gel û neteweya xwe re dixebite.

Termê Nêrgiz Xanimê êvariya heman rojê li nava pêşwaziya gel, di goristana gundê Rajanê de bi axê hat sipartin.

PDKÎ şîn û serxweşiya xwe arasteyî malbat û kes û karên wê û birêz Weysî Mendan dike û xwe di xem û nerehetiya wan de beşdar dizane.

**Riha wê şad be**

## Rojev



# Ehmedînijad vê carê nexwast bîr û raya giştî tûj bike!



Şehab Xalidî

Mehmûd Ehmedînijad roja pêncê Rezberê bo heştimîn car û zêdetir ji her serkomarekî berî xwe - ku ew yek tê wateya hezkirina bê qas ya wî bona derketina pêşberî bîrûraya giştî - li Civata Giştî a NY de ew peyama pêşkêş kir ku li gor gotina navbirî piştî pêdeçûna hûr ji bo xwendinê hatibû amade kirin.

Peyama îsal ya navbirî berevajiyê salên pêşîn ne tenê hilgirê komek pirsên kêşesaz nebû, belkû heta îşare bi pirsk pirr girîng wek Sûriyê jî nekiribû û pitir giringî bi birêveberiya cîhanî, waneya exlaq, û hatina hezretê Mêhdî hatibû kirin ku li gor gotina Ehmedînijad navbirî wê tola belengazan ji zaliman hilîne û dadperweriyê li cîhanê de wê cihgir bike. Axavtinên navbirî ku hemû salê tenê bona mesrefa navxweyî û rakişana bala xelkê Îranê bo aliyê dujminê ferzî ên wek Îsraîl, Amerîka û ... hwd, bona dapoşîna arîşe û kêşeyên bê qas ên navweyî ên wan bûn, lê îsal bi sedema vê ku ew li jêr zextek zêde de ne, serkomarê rejîma Îranê neçar bûy bona pêşîgirtina ji geşekirina wan zext û guşaran wek salên berê kêşeyan ji xwe û nîzama xwe re saz neke, belku bi baskirina ji exlaq û cihgirkirina dadperwerî ku li rastî de ew yek tevî kiryarên wan nakokî heye, peyama xwe tijî bike.

Di rastî de mifahwergirtina ji tirîbona Civata Giştî a NY ku divêt bo baskirina li ser pirsên giring ên cîhanî û navnetewî û herweha berevanî ji berjewendiya neteweyî ya neteweyên welatê wan be, bikaranîna bo baskirina li ser pirsên ayînî û baskirina ji hatina hezretê Mêhdî her ew hinde giring û cihê qebûlê ye ku hemwelatiyeke Amerîkayî li cem rêberê nizamê wate Elî Xamineyî bas ji azadî û demokrasiyê bike.

Di nav serkomarên pêştir ên rejîma Îranê de jî tu yek ji wan, ji vê tirîbona giring ya NY bo berevaniya ji berjewendiya netewî a neteweyên Îranê mifah wernegirtine û tenê bîr ji çawaniya parastina deshilata xwe kirine.

Recayî bas ji çawaniya hatine ser karê a nîzama xwe û serkevtina xebata bi dijî şa dikir, Xamineyî bas ji alîkarî û hemdestiya Amerîka li gel hikumeta Be's a Îraqê û Xatemî jî bas ji anîna azadiyê bo xelkê welatê xwe û baskirina ji gotûbêja şaristaniyetê dikir ku bi wan dirûşman karî temenê rejîmakê dirêj bike ku weha xelkê welat xistiye tengaviyê de ku kes nekare hewayê azad hilmije.

Bi hêviya vê yekê ku rojekê xelkê welatê me bikarin nûnerê rastîn ê xwe bo nawendeke weha girîng a cîhanî bişînin ku bikare hêjayî nûneratîkirina xelkê xwedî şaristaniyet û pêşkewtî ê welatê me be û bikare berevaniyê ji berjewendiya tewaya gelên belengaz ê welatê me bike.

www.arsivakurd.org

# Jin di civakên Îslamî de

N: Meryem Mehdewî
W: Arıf Vêlzî




Di rastî de tund û tûjiya li dijî jinan ji dewrana pêgiraniya wan ve dest pê dike, di vê demê de ku dayik û bav daxwaz dikin ku zarokê wan kur be û dibêjin; hêvî dikim ku zarok keç nebe.

Yan jî seba keçbûna xwe, li ser zext û givaşa bav û hinek caran jî li ser îzna dayîkê zarokê di zikê xwe de, li ber xwe dibin, û gelek caran jî piştî jidayîkbûnê tê şikandin û dikeve ber pêlên ferq û cudahiyan û heya dawiya jiyana xwe seba kevneşopiyên Îslamî û civakî di gel astengên zaf berbirû dibe.

Pênaseya tundûtîjiyê
Tundûtîjî riftarek e ku bi merema gehandina xisarên leşî, derûnî, sepandina astengên malî, rêgirtin ji pêşveçûnên karî û xwendinê, rêgirtin ji şiyanên take kesî û ...hwd, li hember kesek din tê kirin. Serdemên sereke yên rûdana tundûtîjiyan vedigere ser ferq û cudahiyên cinsî û wekheviya jin û mêran di tewahiya babetên jiyanê de, ji mal û malbatê ve bigre heya babetên hiquqî û civakî.

Curên tund û tîjiyên li dijî jinan
Tund û tîjiyên leşaî ên eşkere: Di vî haletî de jin dikeve ber lêdana bi awayên cur bi cur.
Tund û tîjiyên cismî ên veşartî: Di haleta nihênî de jin ji mal tê derxistin, di demên nîva şevê de, yan jî lihevdana derî û pencereyan bi merema çêkirina xof û tirsê di dilê wan de, û têkdana sivik û maseya nanxwarinê û herweha şikandina alaw û tiştên nav malê.

Tund û tîjiya li dijî jinan gelek alî û hewzeyan bi xwe ve digire, lewma em dikarin ev kiryara qirêj bi ser sê desteyan de parve bikin:
Hewzeya malbatî û jiyana taybetî
Hewzeya civakî (cihên kar, xwendin û cihên giştî)
Ji aliyê dewlet û binyatên fermî ên deshilatê
Di çarçoveya deshilata dewletê de, tund û tîjî ji riya pesendkirina yasayên pir ji ferq û cudahiyên şikêner li dijî jinan û sehmiyebendiyên cinsî û pêkanîna asteng û arêşeyan li ser riya beşdariya jinan di warê yasadananê de, û herweha beşdarî di biryardanên biçûk û mezin ên siyasî, civakî, abûrî û çandî, yan ji di girtîgeh û zîndanan tê birêve birin. Xala balkêş ew e ku di zîndan û girtîgehan de, serbarê vê ku jin weke mêran tên îşkence û serkutkirin, mixabin seba jinbûna xwe dikeve ber destdirêjî û azarên cinsî.

Yek ji sebebên tund û tîjiyê vedigere ser hebûna hêza mêran ji aliyên abûrî, siyasî, çandî û civakî di malbatê de, û vê yekê jî peywendiyek rasterast di gel yasayên pir ji tundûtîjî di civaka Îranê de ye û emniyeta jinan di malbat û civakê de dixe metirsiyê de.
Bo mînak li gor Yasaya Bingehîn ya Îranê, jin dibe peyrewiyê ji mêr bike, bi vê wateyê ku hekî jin pêrewiyê ji mêrê xwe neke, mêr dikare jinê neçar bi pêyrewîkirina ji xwe bike û herweha ji hinek aliyan ve yasa îzna mêran dide ku jina sîxeyî ji xwe re hilbijêre û diyarîkirina şêwaz û çawaniya peywendiya di navbera wan de jî, di destê mêran de ye, û di vê haletê de jinê tu deshilatek bi ser cesteyê xwe de nine û gelek caran dibe sebeb ku peyrewiyê ji mêrê xwe neke û ew jî dibe hokarek sereke ku mêr daxwaza telaqê bike û li gor yasayê mêr dikare marehiyê nede û bi vî awayî tund û tijî li hember jinan yasayî dibe.

Di civakên rojhilatî û Îslamî ên weke civaka Îranê de, di bin siya yasaya bingehî de, jin dikeve ber lêdanê û di hember de mêr nahê cezakirin, di yasayê de mafê du canî û mafê cinsiya wan bi awayek berfireh hatiye binpêkirin û herweha jin ji ferq û cudahiyên cinsî weke nebûna mafê telaqê, mafê qezawetê, şahidiyê, mafê hilbijartina kar, derketin ji welat bi bê îzna mêr, wekhev nebûn di warê dana mîrat û naberamberî di yasaya cezadanê de bi awayek berfireh êş û eleman dikişînin.

Qetlên namûsî jî, cureyek din ji tundûtîjiyan e ku bi piştevaniya yasayê tê encamdan, di yasaya îslamî ya sizadanê de, mirov di hinek rewşên xasmanî de dikare dest bavêje kuştina jinê bê ku bête sizadan.
Bo mînak di madeya 630 ya yasaya cezadana îslamî de hatiye ku hekî mêrek jina xwe di halê zinayê de bibîne, dikare di heman demê de jina xwe bikûje.

Tund û tîjî li dijî jinan weke diyardeya herî qirêj ku sembola ferq û cudahiya cinsî di civaka Îranê de ye, vedigere bo kêmasiyên ferhengî di civakê de ji aliyekê û ji aliyê din ve jî, piştevanî nekirina yasayê ji jinên ku dikevin ber tund û tîjiyan ku encama wê jî dibe ew ku li hember wan kiryarên nemirovî de xwedî sebr û tehemûl be û jiyana xwe gorî sunet û yasayê Îslamî bike.

# 5'ê Oktobr roja cîhaniya Mamosta



Roja 5'ê Oktobrê,roja Cîhaniya mamosta ye. Ev roja han di sala 1994'ê de, ji aliyê UNSCO'yê ve hate diyarîkirin. Di biryarnameya ku ji aliyê UNSCO'yê ve hatibû pejirandin, ev roja han weke sembola xebata ji bo zêdekirina koalîtiya perwerdeyî û herweha koalîtiya kar û jiyana mamostayên welatên cîhanê ye. Ev roja han di sala 1373'an a rojî de ji aliyê dewleta Mihemed Xatemî ve bi şêweyeke fermî hat naskirin.

Ev roja han di rewşekê de li Îranê tê lidar xistin ku rêxistinên mamostayan bi daxûyaniyên curbicur, guhnedan bi daxwazên mamostayan û herweha bo bidestveanîna jiyanek baştir û perwerdeyek serdemiyane, di xwendegehan de ku ji kêmiya bûdceya Wezareta Perwerde û Hînkirinê çavkanî digre, rexne dikin.

Mamostayên Îranê niha di rewşek nebaş de ne, û neçar bi encam dana karên herî zehmet in, bi xasmanî mamostayên ku dersê dibêjin. Mamostayê ku dersê dibêjin di rewşek pir xirab de ne, û herweha di herêm û navçeyên dûrdest de kar dikin, lê ne destheqek baş hene û ne jî pêşerojek baş li warê aborî de.


Gellek ji wan heta Bîmeya Dermanî jî bi wan re rewa nahê dîtin. Eva di demekê de ye ku her mamoastayek dibe di warê dahat û rewşa aboriya xwe de xatircem be û bikare zanyariyên zanistî ên rojev bi dest bixe û bi wan zanyariyan dersxwanan bi awayê herî baş perwerde bike.

# Rejîma Sûriyê gefa girtina dibistanên Kurdî xwar

**Pêka rapora Malpera "Dengêifrînê" rejîma Sûriyê gef ji Kurdan xwar û ji wan xwest zimanê Kurdî rakin û perwerde bi zimanê Erebî bê dayîn.**

Li gor jêderan hemî dibistanên seretayî ku di qonaxa nû ya perwerdê de ji aliyê Kurdan ve kiribûne Kurdî, bêne rakirin û perwerde dubare bibe zimanê Erebî, yan jî dê ew dibistan ji aliyê Wezareta Perwerdê ve bêne girtin.

Îsal di destpêkirina qonaxa nû ya perwerdê de zêdeyî 20 dibistanên seratayî bi zimanê Kurdî dest bi perwerdê kiribûn û hemû dirûşme û sirûdên girêdayî Beisiyan hatibûn rakirin.



Hinek ji wan Dibistanan ji aliyê meclîsa Kurdî ve û hindek jî, ji aliyê Partiyên Kurdî ve hatibûn vekirin.

www.arsivakurdi.org

Fethullah Xûbayî:

# jin û zarok û pîr û ciwanan pêşwaziyek gellek baş ji me dikirin, lewra me digot ku divêt li xebat û tekoşîna xwe de, em hêjayî vê hezkirina wan bin



Ez Fethullah Xûbayî sala 1346'ê li gundê Bereso ya ser bi herêma Somayê ji dayîk bûme, navê bavê min Ehmed naskirî bi Ehmed delo ye, û ji sala 1359'ê ve, bi awayek fermî min pêwendî bi PDKÎ re girt, û ji vê demê pêve heya niha ez di nav refên şoreşê de me.

Nasyariya min bi PDKÎ re vedigere ser hizbîbûna malbata min, ji ber vê yekê ku malbata min bi PDKÎ re bûn, û herweha birayek min bi navê Efendî Xûbayî di sala 1359'ê de şehîd bûye.

Fethulla Xûbayî derbarê jiyana pêşmergatiyê weha ji me re axivî: "jiyana pêşmergatiyê tê wateya qebûlkirina zehmetiyan.

Ew sextî û zehmetî bona vê yek ne ku li pêşerojê de gelê me bextewer be û jiyanek baş hebe. Gellek caran hevalên me li rex me, li çeperên berxwedaniyê de şehîd dibûn, şehîdbûna wan em pitir han didan bona berdewamiya xebat û tekoşînê".

Fethulla Xûbayî herweha dibêje, dema ku li sala 1368'ê de ez li gel pêşmergeyan çobûme herêmê, li wan gundên sînorî ên Turkiyê de hinek xizmên me hebûn, ku wê demê wan xizmên min daxwaz ji min kirin ku ez herme cem wan û li PDKÎ veqetim, lê her di vê salê de bû ku Dr. Qasimlo hate şehîdkirin û vê bûyerê ez gellek xemgîn kirim û wek her kurdekî din bandor li ser min danî, lewra min biryar da ku riya wan şehîdan bitaybetî a şehîd Dr. Qasimlo bidomînim, û heya niha jî ez di nav refên PDKÎ de xebatê dikim.

***Dema ku Dr. Qasimlo hate şehîdkirin, vê bûyerê ez gellek xemgîn kirim û wek her kurdekî din bandor li ser min danî, lewra min biryar da ku riya wan şehîdan bitaybetî a şehîd Dr. Qasimlo bidomînim***



Em neteweyek in, ku bi sala ye li jêr zulm û zordariya dujminan de dijîn û welatê me hatiye parvekirin, divêt em bona azadiya Kurdistanê berdewan bin li ser xebat û tekoşînê.

Navbirî herweha derheq pêşwaziya xelkê Kurdistanê ji pêşmergeyan dibêje: " Kurdistanê ji me nebaya, tu caran me nedikarî weha li kar û xebata xwe ya pêşmergetiyê de serkevtinan bi ser dujmin de bi dest bixin.

Fethulla Xûbayî derheq beşdariya xwe di şerê herî navdar ê li Kurdistanê de, wate şerê Ceterê li bakûra Kurdistana Îranê de weha dibêje: " Rejîma Îranê li sala 1363'an de, li bakûra Kurdistana Îranê de xwe amade dikir da ku derbek dijwar li pêşmergeyên PDKÎ bixe, eva bû ku dema zanî em li Ceterê de ne, bi hêzek zaf ve êrîşî ser herêmê kir.

Li encama bersivdana me bi vê êrîşa hêzên rejîmê, zêdetir ji hezar kesî ji hêzên rejîmê hatin kuştin û birîndarkirin, lê ji hêza pêşmerge jî 13 kes şehîd bûn û tevlî karwanê



Foto: Kavûs Ezîzî

**Ji aliyê rastê ve: Fethullah Xûbayî, Rostem Cehangîrî,Kerîm Îsmaîlî,Menaf Pezîrî, Eyaz Sehrayî, Mêhran Îbrahîmî**

pêşmerge ji aliyê gel ve pirr tê hezkirin, û navekî muqedes e, ji ber ku ew canê xwe di riya azadiya gelê xwe de gorî dikin.

Dema ku bi rastî em diçûne nav gelê xwe de, jin û zarok û pîr û ciwanan weha pêşwazî ji me dikirin, ku me jêve bû em divêt li xebat û tekoşîna xwe de hêjayî vê hezkirina wan bin. Wan wek zarokên xwe em himbêz dikirin û wê reftara wan moralek bê qas dida me.

Wan heta kincên me dişûştin, xwarin ji me re amade dikirin, û birîndarên me bi me re derman dikirin. Lewra heke piştevaniya xelkê sorxelate hizb û gel bûn.

Di rastî de ew şer şereke gellek dijwar bû û berxwedaniya pêşmerge li vî şerî de êdî wek hemaseyekê tê baskirin, û baskirina ji hûrdekariyên vî şerî hewcehî bi demek zêde heye ku li vê hevpeyvîna kurt de ez nikarim hemû hurdekariyan bas bikim.

Lê komara Îslamî di vî şerî de şikestek weha dijwar xwar ku li ciyê vê ku hêza pêşmerge ji xebat û tekoşînê mandî, û bê hêvî be, berevajî bi piştevaniya xelkê xebatkar ê Kurdistanê hêvîdartir ji berê biryara xebatê da".

## Evîna Zarokên Çiyê

Dagîrkeran, dagîr
kiriye hembêza dayîka min
Reş kofî girêdeye xaka min!

li şûna barana Nîsanê
Agirê dojehê dibarînin li zeviyê warê min
bi hovitî binpê dikin û diçilmisînin
Sorgulên baxçê bihişta min,

wêran û talan kirin
hêlîna zarokatiya min
Koçber kirin evîn
û dildar xwînî bûn
Îro jî dixwazin hêviyan tune bikin

lê divê bê zanîn
Cûdî bû li hemberî tofanan,
hêvi di hembêza xweda diparastin,
li dîji fermanên xwedanê tofana mirinê

Vayê ji nû ve avis dibe,
Axa zarokên çiyê,
bi Tîrêjên Rojê sorgul dipişkivin,
bi Tîlîlîyên bayê bakur
Govende digerînin ,
xwedawenda evînê
me sund xwariye,
bi ayetên Zend Avesta
bi Agirê Zerdeşt
û em carek din!
Sund dixwin bi germahiya Rojê
bi eşq û evînê dayîka nîştiman

ku emê li ser serên te
reş kofiyê rakin
û bi sorgulên ku bi xwîna evîndarê xakê rengîn dibin, û
bi kenê çavên te bêhna dilê xwe bişkînin
Emê nehêlin ku tu bibî Dojeh
tu wê bibî Bihuşt bimînî
hembêza te wê ji bona zarokên
Çiyayê timî hêlîn be....

N: Îdris Gengeç

www.arsivakurdi.org

# Şaristana Bîcar



Mecîd Cinîkanlû



Bîcar yek ji Şaistanên din yên Parêzgeha Sinê li Rojhilatê Kurdistanê ye. Rûberê Giştî yê Şaristana Bîcarê 7730 Kîlomêtra çar gûşe ye, û Xwediyê 288 gundan e. Şaristana han ji aliyê bakûrê rojhilat tevî Parêzgeha Zencanê, li aliyê bakûrê rojava tevî Tîkabê, li başûr tevî Qorwê û li bakûrê rojawa tevî Parêzgehên Hemedan û bajarê Sinê hasînor e.

Herêma Bîcarê, herêmekî çiyayî û pitir ji yek ji Sê a rûberê giştî yê Şaristanê çîya ne. Navê kevin yê Bîcarê Bîd Zar bûye. Dîrokzan sedema binavkirina vê yekê jî ji bo vê yekê vedigerînin ku li serdemê Nasiredîn Şahê Qacar de, biryar wisa bûye ku hin fermanên dewletê li şevê bihên bilavkirin, lê sibêzû hemû xelkê bajêr ji fermanan haydar bûne û seba vê yekê jî navê bajêr bi Bîcar hat binavkirin.

Hin kes jî li ser vê baweriyê ne ku Bîcar bi wateya Sebzî û Giya tê, û Heft Bîcar ku Xwarinekî herêmê ye ji heft giyayan pêk tê. Eger wisa be Bîcar bi cihê Bax û Sebzîyan tê gotin ku ji bo cêjin û şahiyên Hozên Kurd wek cihekî baş tê dîtin, û bi taybetî ji ber wê yekê ku Bîcar li berbiniya çiya û li cem Kanî û çemên xweş hatiye çêkirin û ev yek jî bûye sebebê avedaniya herêmê û xelkekî zaf ji bo aliyê xwe rakêşa ye.

Herêma Bîcarê bi çiyayan hatiye dorpêçkirin û li herêmê de çiyayên wek: Hemze Ereb, Niqare, Badamistan, Zaxe, Nisar, Şaha, Çeng Elmas û ... hene ku li wan çiyayan gelek cureyên balinde û ajelên kêvî jiyanê dikin û herwisa li wan çiyayan gelek giyayên xwarinê hene ku gelê herêmê jê mifahê werdigrin

**_Li herêmê de pitir ji 60 asewarên dîrokî hene ku piraniya wan seba siyasetên şaş yên Komara Îslamiya Îranê li hemberî Netewa Kurd li halê jinavçûnê de ne, û gellek ji wan asewarên dîrokî bi destên çete û kesên ser bi dewleta Îranê hatine talankirin û ji bo welatên Ewropî û cihên din hatine şandin_**

û gellek caran jî ji bo firotinê ji bo bajarên wek Zencan û Sinê tên şandin.

Çîyayên herêmê cihekî gelek baş ji bo pezdaran e û li demsala havînê ew çîya dibin cihê pezdarên herêmê û dever hemû dibe cihê zozan û warên Werzêrên Kurd.

Li nava bajarê Bîcarê ku bajarekî gelek mezin nîne, nêzîk bi 68.386 kes jiyanê dikin. Li pişt bajar û derdora bajar bi sedan Bax û Baxçe hene ku bajar li hembêz girtine .

Kurdên ku li Bîcarê jiyanê dikin li gelek hoz û eşîrên Kurdan pêk tên lê bi xweşî ve bi salane bi hevra jîyanê dikin. Kurdên herêmê hemû Musilman in û hin ji wan Şîe û yên dinê Sunnî ne . Tê zanîn ku berî Şoreşa Îranê a li sala 1975'ê li wê herêmê de gelek Yehûdî û Mesîhiyan jiyan kirine ku ew yehûdî piranî li ber zext û zoriya dewleta Îranê bo Îsraîlê rewiyan û li wir akincî bûn. Mesîhiyên li Bîcarê piranî ji bo bajarên mezin yên Îranê wek Tehran û Îsfehanê çûn û li wir akincî bûn.

Li herêma Bîcarê wek hemû bajarên din yên Kurdistanê rejîma Îranê her ku diçe dixwaze li navbera gelê herêmê alozî û pevçûn hebe û seba vê yekê gelek car li hestên mezhebî yê xelkê mifahê verdigire. Li rojhilata Şaristana Bîcarê hin Tirk dijîn ku li wir akincî bûne, lê bi eslê xwe xelkê Parêzgeha Zencanê ne.

Li herêma Bîcar gelek asewarên kevin û dîrokî jî tên dîtin ku em dikarin îşarê bi wan cihan bikin: Kela Mezin a Qûm Çeqa, Pira dîrokî a Selwat Abad û... hwd. Li herêmê de pitir ji 60 asewarên dîrokî hene ku piranîya wan seba siyasetên şaş yên Komara Îslamîya Îranê li hemberî Netewa Kurd li halê jinavçûnê de ne, û gellek ji wan asewarên dîrokî bi destên çete û kesên ser bi dewleta Îranê hatine talan kirin û ji bo welatên Ewropî û cihên din tên şandin.

Herêma Bîcarê seba av û hewayê xwe yê bedew xwediyê cihekî gelek xweş e û ew yek jî bûye sebeb ku li herêmê zaf seyranga û cihên geryanê bihên avakirin. Seyrangehên wek bajarê Lîstikê û derdora Çemê Bîyanlo, Serab û Text li cihên herî xweş yê bajarê Bîcarê ne ku pitir li demsala havînê mifahê ji wan cihan werdigrin.

Li nava bajêr de jî gelek bazar û cihên din hen ku gelê herêmê li wan mifahê distîne. Li bazarên dîrokî yên Bîcarê em dikarin Îşarê bi Bazara Kevin ya Êftixar Nizam, Qeyseriya Salar, Emîr Toman û çendîn Bazarên din bikin ku karê dabînkirina hewcehiyên rojane yê xelkê herêmê dikin.

Kurdên li herêma Bîcarê Cêjina Netewî ya Newrozê bi awayekî gelek ciwan rêvedibin û li roja Newrozê hemû diçin bo derveyî malan û ciwan û zarok jî li gellek cihan Eydanê werdigirin.

Her wiha Kurdên herêmê rê û resmên mezhebî wek Mewlûd û cêjinên wek Remezan û Qûrbanê jî birêve dibin.



www.arsivakurdi.org

# Astengên li ser riya sînemakariyê li Îranê de

W:Eskender Ceiferî

Nebaşiya têkiliyên Wezareta Îrşad û Hewzeya Hunerî ji aliyekî ve û dest bi kopalbûna wezareta Îrşad di warê derkirina mucewizên li hevanîna fîlmên nû ji aliyê din ve, bi xasmanî piştî dewreya dehemîn a serkomariyê, arîşên li hember berhemînerên sînemayê zêde kirine.

Fîlmname bi mehan li Wezareta Îrşadê de dimînin da ku mucewiza çêkirina wan bê dayîn. Rewşa Sînemayî a Îranê bi awayekî ye ku sinaryoyên rexneyî, çi civakî û çi jî siyasî, yan bi giştî mucewiz ji wan re nayê dayîn, an jî bi giranî têne sansorkirin.

Sînemakar û berpirsên sînemayan li Îranê, çavnihêrîtir ji berê, sînema xistine nava bandorek nû de. Ji alî din ve rê ji bo çalakiya fîlmsazî û berhemanîna fîlman gelek sînordar bûye. Her fîlmek ku rexneyî be, navê siyasîbûnê bi ser de tê zeliqandin.

Ewa jî di demekî de ye ku fîlmên bi ramanên civakî û hizra rexneyî û Janerek siyasî, du behsên herî cuda ji hev di sînemayê de têne hesibandin.

Berî şoreşa gelên Îranê, rê ji bo berhemînerên serbixwe vekirî bû û fîlmsazan dikarî bi çêkirina fîlman, ramanên xelkê ji bo aliyê siyasetê ve bikişînin, û wan rewşa dije çandiya civakê û bandorên berî şoreşê dixistin rojevê.

Ji alî din ve di wê rojê de ku "Oganays" ê berhemhînerê fîlma "Hac Aqa Aktorê Sînemayê" meyla Hac Aqa ji bo mêzekirina leyîz û reqsa keçikan beriya Yasaya "Rakirina Hicabê" bi destên Riza Şah nîşan da, heya dema ku kesatiyê yekemîn ê fîlmê bi navê "Daryûş Mêhr Cûyî" di fîlmê de bû Çêlek, û heya dilsarbûna Qeyser ji Sîstema Dadweriya Îranê û helwesta ji bo tolhildanê, û di dawiya çîrokê de "Sefera Kevir û Karmamizan" îdî dosyeya fîlmên siyasiye berî şoreşa gelên Îranê tê girêdan. Zorîneya fîlmên berî înqilabê, rexneyên çêker û Janerên siyasî bûn.

Piştî înqilabê, rewşa siyasiya sînemayî, giran û zehmet bû. Hêj çaşniya Îdeolojîkê bi li hevhîneriya fîlman hate zêdekirin.

Sînemaya Îranê piştî înqilabê jî serdemên berê bi çavên xwe dîtibûn. Ew bandora nû jî di rojên destpêka sînemayê de çê bûn û ji sînemayê re digotin "Mubtezel" wate "Fasid". Ku ew yek, ji bawerên Îdeolojîkî pêk dihat.

Sînemaya Şer a Îranê jî hewil dida ku tirsa gencan ji mirina di şer de birazîne û gencên Îranê bivêrekane biçin şer. Rewşa ku li Îranê jê re dibêjin "Dowomê Xurdad" ku destpêkek ji bo guhartinkariya di sînemayê de bûn û ji nihêrînek Jornalîstî ve dest pê kir û ber bi li hevanîna çend fîlmên rexneyî ji bandora wê demê a siyasî û bi taybetî "Bertekên Nerazîtiyê" ve diçûn. Ew rewşe dimeşiya heya ku hilbijartina Serkomariyê, rewşek nû bi ser xelkê de ji bo demekî pêk anî.

Serdema ku piştî hilbijartinê pêk hat, digel serdema berî xwe ferqeke sereke hebû ku ew jî nebûna derhînerên serbixwe bû ku bikaribin siyasetê bidin ber rexneyê.

Di bandora ku li wê demê pêde li hev hatibû, îdî derhînerên serbixwe nedihatine tehemulkirin û ji holê dihatin derxistin.

Di rewşa ku tê de tevgerên serbixwe çi nebûn, fîlmek bi navê "Qeladêhayê Tela" wate "Qeladeyên Zêrîn" derxistin holê. Rexneya fîlmê bawerek cuda ji ramana nivîskarê fîlmnameyê bû. Lê li wir ew pirsyare derdikeve ku bi rastî nêrîna sînemakaran li ser wan fîlman çî ye?! Û li gor kîjan dadweriyan bûye ku ji wê fîlmê re dibêjin siyasîtirîn fîlm di dîroka sînemaya Îranê de?!

Ramanên weha bo nasandina fîlmekî, Janerên siyasî û hizrên desthilatdarên sînemaya Îranê ji bo xelkê dirojevîne û ew jî ew e ku; Sîstem nikare bipejirîne ku reqîbên sînemaya siyasî jî di holê de hebin, û di heman demê de çi bûdceyekî jî bo derhînerên serbixwe çevrê nake.

Bi giştî mirov dikare bibêje, derhînerên sînemaya Îranê weke ku hewcehî dike ji bo çêkirin û li hevanîna fîlmên ku zerermendiya civaka niha a Îranê di warê sînemayî û çandî ji aliyê desthilatê ve nîşan bidin, nekarîne deyna xwe a bi gelê xwe, ji bo nasandin û guhartina rewşa siyasiya Îranê bi cih bînin.

Çavkanî: WWW.BBC.COM



## Xwendina bi Kurdî a Latîn li Ermenistanê dest pêkir



**Têkoşîna Kurdên Ermenîstanê gihîşte asteke birûmet û di warê çalakiyên Perwerdeya Kurdî de li Ermenîstanê Kurd bi Kurdî perwerde dibin û tîpên Latîtnî jî, ji zimanê Kurdî re hatine pejirandin.**

Kurdên li Ermenîstanê ku ji sala 1941'an ve perwerdeya Kurdî ya bi tîpên Krîlî dibînin, piştî têkoşînek demdirêj, di sala 2010'an de mafê perwerdeya Kurdî ya bi tîpên Latînî bi dest xistin.

Dewleta Ermenîstanê îsal ji bo perwerdeya Kurdî ya bi tîpên Latînî ji dibistana seretayî heta amadeyî biryar da, û bi awayeke fermî perwerdeya Kurdî ya bi tîpên Latînî dest pê kir.

Ev demek direj bû ku li Ermenîstanê dersên Kurdê lê bi tîpên Krîlî dihatin dayîn.

## Kaniya helbestan



### Newroz

Nûroj hat
Bi dengekî bilind
û bitesîr bistirê
Bila li çiyê
Tajiya li dû nêçirê
heş berde
û bi kewa gozel re
rabe govendê

Bila roj biçin ava
Dem biherikin
Sal derbas bibin
Her sal,
Bila her demsal
kirasê xwe biguherin
Zagonê xwezayê
biguherin
Xela ber bi rizgariyê
ve biçe;
Hejmaryariya
pêşerojê bike
Keziyên xwe hêdî
hêdî bihûne
û biskên xwe hine
bike
Bilbilê reben ,
Bila şilaqa çavên
xwe paqij bike
û timbika xwe şe
bike
Nêrgiz, şîlan
Sosin û beybûn
Bila bi hawar gulê ve
biçin
Ew delingê wê;

www.arsivakurd.org

**Agirî**

Duheftînameyek siyasî, civakî, çandî û hunerî ye
Ku Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê diweşîne

www.kurdistanmedia.com/kurdi
Navenda bingehîn ya xebata Agirî li Kurdistanê ye.
Navnîşana derveyî welat:
AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE
E - Mail: agiri2003@hotmail.com
agiri2003@gmail.com, rojnamaagiri@gmail.com



# Çend dîmenên Kongireya 15'ê a PDKÎ- Başûrê Kurdistan, Koye



























